

fexrek mezine ku dîsa tu bû sedema vê ,
cejnê . Îro girî ji me re nabe, em gereke şa
bin , hevalê me di rêkekê de çû , ji me giya
re ew rêka fereh kir , û em giş pêra çûn û
meşiyar

Herbijê heval ...

Her tu bijê li wa dunyê û tu tim di bîr û
baweriya me de yî , û ciyê te tim di dilê me
de ye

Herbijê di xweşiyê de .

Li dawiyê, Kurê wî, Endezyar Xoşnaf, bi
navê malbatê sipasiya hemî beşdar û
berketiyên siyasetmedarê hêja kik.

Hêjayî gotinê ye ku, pir nameyên sersaxiyê
ji bal dost û berketiyên bavê Qedrî di
malperan de weşîn. Emê ji xwendevanên
Newrozê re, nama Îbrahîm GUÇLU (Selîm
Keya) û Bawerê Omerî biweşînin:

Xwişk û Birayên Delal

Welatparêzên Kurdistanê

Dema ku min bihîst ku biramezin û
siyasetvanê Kurd, xebatkarê doza miletê
Kurd (Reşîd Hemo) çûye ser dilovaniya
Xweda; Ez gelek xemgîn bûm. Ez baş
dizanim ku gelê Kurd bi koçkirina wî
gelek xemgîn in. Lewre gotar û nivîsarên ji
bona wî hatine nivîsandin jî, vê yekê diyar
dikin.

Min ew di sala 1979-an de li Qamişloyê
naskir. Wê demê ew berpirsiyar û
îdeyologê Partiya Demokrat a Pêşverû ya
Kurdli Sûriyê bû. Ew xezna çand û dîroka
Kurd bû. Her kurdperwerekî ji wî re rêz
digirt. Ta roja ku çû ser dilovaniya xweda
jî, ew xwediyê qedir û qiymeteke bilind bû.

Ew ji bona Kurdên Bakurê Kurdistanê
xwediyê taybetiyekê bû. Lewre di sala
1965-an de ji bona ku Partiya Demokrat a
Kurdistanê Tirkîyê ava bibe, hatibû Bakurê
Kurdistanê ,li ser navê hevalên xwe bibû
alîkar.

Bi koçkirina Birayê Mezin Reşîd Hemo
miletê Kurd, siyasetvan û rerwşenbîrekî
xwe yê delal û xebatkar wenda kir. Ewê di
nav tevgera rojavayê Kurdistanê de
valahiyeke mezin jî çê bike. Divê ji bona
ev valahiya bê dagirtin, xortên Kurd
xebateke bêhempa pêk bînin.

Bila serê malbat, heval û gelê Kurd sax be .
Bila ciyê wî bihuşt be .Oxir be birayê
mezin.

Îbrahîm GUÇLU (Selîm Keya)

Bakurê Kurdistanê/Amed

Sersaxî

Vê nûçeya nexêre ez
pir xemgîn kirim. Lê
madem xwedê jê xweş
Reşîdê Hemo bi berhem
û ked û xebata xwe di
nav miletê xwe de deng
daye, û bermayên pir
dewlemend di dîroka
miletê Kurd de hiştiye;
Ew li cem min hîn jî zindî ye.



Ew gorbihîstê dilsoz ku, karîbû pirê jiyana
xwe ji bo dozekê terxan bike, helbet nifşên bi
dû wî re, wê ji behemên wî bêpar nemînin.

Ew hêza xebata kurdperwerî li cem wî
bandora xwe ya kûr di nav dilê miletê Kurd
de hiştiye. Wî bi mirovatî û dilawerî, xwe
kiriye nîşana qubaniyê ji miletê xwe re, ew
dibistana ku ew jê fêrî kurdperweriyê bûye,
hîn jî dergehên wê vekirî ne, û ew rêka dijwar
ya ku wî ji bo milet û welatê xwe helbijartibû,
hîn em li ser wê diçin.

Sersaxî ji miletê Kurd re û Xwedê aramiyê
bide malbata wî û cihê wî di bihiştta nemiran
de be.

Bawerê Omerî

18.12.2010